Li ber roniya vexwendina vê komîtê , ev cara diwem e, em têne şam û mirina lawê Kurd yê bi nav û deng N.Z bi bîra xwe tînin . Di cara yekem de , me N.Z wek zimanhezekî bi beşdaran da nasîn , herweha me Rojnama Newrozê , di ber çavan re bir û anî û rola wê di dermafê fêrkirina bi dehan xelekên alfabê û rêzimên ji keç û lawên Kurd re , me da xuyakirin . Wêlomê jî ,me ji birêz Zaza re got, di gora xwe de vehesî be , law û keçên Kurd şopên yên weke te bernadin .

Di vê boneya bîranînî ya diwem de jî , dixwazin ji xwe re bikin keys , kelk û sûdê, ji gotina **Celadet** ya dîrokî werbigirin.

Yekîtiya gel bi yekîtiya zimên e , yekîtiya zimên jî , bi yekîtiya tîpan e .

Li ber roniya gotina jorîn, em dixwazin nêrîneke zimanewî ,bi ziman û gelê me gereke, bidin xuyakirin .

Weke em dizanin , bêparbûna netewa Kurd ji sed salan ve , ji avakirina dewleteke yekbûyî , bû sersedema diyarbûna gelek zarav , tore û alfebeyan. Di zimanê Kurdî de, ev pirbûna zaravan, bi xwe jî, di roja îro de , ji pêşeketin , vejîn û dewlemendkirina zimanê me re sermiyanekî baş e. Ji zaravên Kurdî, hin hene yên peyvandin û azaftinê ne , mîna Kurmanckî , Dumilî , Zazakî , Hewramî , Gorî û Lorî . Ev zaravina Kevin in û di dîrokê de tamar berdane . Vêca bikaranîna wan , ji bo geşkirina zimên pêwîste.

Lê , li kêlekê di cîhana tore û rojnamegeriyê de , herdu zarav Soranî û Kurmancî bi kar tên û li çar perçeyên Kurdistanê têne têghîştin .

- Li aliyekî dî , berê nivîsandina Kurdî, bi sê alfabeyan bi kar dihat (Latînî – Erebî – Kirlî) . Ta ku , Kurdên Sovyêta berê dev ji alfabeya kirlî berdan û li şûnê alfebeya Latînî bi kar anîn , kend û girêk li pêş yekbûna zimên kêmkirin .

Em dizanin ku , bikaranîna alfabeya Erebî , li başûr û rojhilatî Kurdistanê ye. Û alfabeya Latînî jî, li bakur û başûrî rojavayî Kurdistanê , Ewropa û li Sovyêta berê bi kar tê. Ji berê-paşê ve , zimanzan û zimanhezên Kurd yên mîna Nûredîn Zaza , Ji ber ku , yekîtiya zimên ,di wê de didîtin, daxwaza yekîtiya bikaranîna alfabeyekê dikirin . Herweha yekîtiya gelê Kurd jî, xurt dibû . Lê, berê piraniya wan, ji ber van sedeman ve, ber ve alfebeya Latînî ya **Celadet Bedirxwan** bû .

1-Alfebeya di cîhanê de , tewrî bi kar tê, alfebeya Latînî ye .

2-Alfabeya Latînî , Alfabeya Kompiyoter û entirnêtê ye jî .

3-Fonotîka devkî, ya zimanê Kurdî bêtir, bi riya alfabeya Latînî zelaltir dibe û cî tê de digire .

4-Piraniya xelkê me yê Kurd , ta hin girop ji Kurdên başûr jî, vê daxwazê dikin .

5-Ji paşeroja gel û zimanê Kurdî re jî weha baştire , ji ber ku , bi wê ziman û gel, wê were parastin û li gor demê be .

Piştî azadbûna beşê başûr , herçû ev daxwaz û hêviya jor bi hêztir û bilintir bû . Lê mixabin biryara perlemana Kurdistana başûr, ji bo bikaranîna alfabeya erebî ,wek alfabeyeke fermî ,di hemî dezgehên hikomet û civaka xwe de , ew hêvî qelskirin û bêhêvîtiyek peydakir .

Vêca, bi navê vê şevê , em ji serokê navçeya Kurdistanê (Kak Mesûd) ,Hikometa Kurdisatanê û Parlemanê re pêşinyar dikin ku , bangek bi rê be . Têde ev daxwaz diyar bibe û bi kêmanî alfabeya Latînî (alfabeya Celadet , Nûredîn û piraniya gelê Kurd) netê qedexekirin .

- Bijî gelê Kurd!
-Ramana Nûredîn Zaza namire!
-Sipas ji komîta rêvebir ya xelata N.Z
-Sipas ji we û guhdariya we re !

Komîta rêvebir ya weşana Nwerozê